
# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (248):

**Gundê "Turindê" - kuştina zarokina û koçberineke zorane, hilmeteke/ kampaniyeke girtinên bêsûcane, geregoşiya çekan û kuştina temenmezinekê, qutkirina dar û daristanan**




























Girtinên bêsûcane di dermafê Hemwelatiyên Kurd de -nişteciyên resen ên mane - berdewam dikin, bi tuhmetên têkildariyê bi Rêvebiriya Xweser (R.X) a berê re û hine din en çêkirî -ta ku sedem pişikdariya rojek tenê ji payandina şevayî be jî- digel ferzkirina sezayine mezin ji hepis û baceyên diravî, vê re jî kêmrûmetkirin û îşkencekirin û veşartina zorane û hin din ji rengereng danûstanên sert, ji bilî wê jî mirinên di bin îşkencê de, bi ser de jî reşwet/ çilekî û vêrgiyên diravî, ew jî piştî borandina (5 ta11) salan di ser wan heyînan re (yên ku ji aliyê amûrên dadwerî û ewlehiyê yên çêkirî ve û bi serpereştiya Istîxbarat û cîgirê giştî yên Turkî de bi "tewanên endamtiyê yan hevkariyê yan jî kar bi Partiya Karkirên Kurdistanê PKK" re têne salixdankirin); Herweha jî daxuyaniyên girtiyan ên kesayetî di lîsteyên bi navê "lîsteyên terorê" de têne sazkirin, ên ku yeser jî bo "Anqerê" têne şandin.

**Ev jî hin heyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Gundê "Turindê":**

Navê erebkirî "Zerîfê" ye û bi navça Navenda Efrînê ve girêdayî ye, /2.5/KM jê dûr e, ji dora /300/ malî pêkhatî ye, dora /1500/ nişte tê de bûn, li dema dijberîkirina li ser herêmê piranî ji gund derketin, jê dora/50 malbat = 200 nişte/ vegerîn û yên din jî zorane koçber bûn, û dora /250 malbat = 1500 nişte/ ji anîndeyan tê de hatin niştecîkirin.

Di encama bombebarankirina gund de li dema dijberiyê, ziyan bi piçekî gihîştin mizgeftê û hin malan, jê yên "Mehmûd Ebdalo, û Hemîd Ebdalo", lê Mala "Mistefa Reşîd" bi tevahî hate roxandin, û sê zarok jî tê de pakrewan bûn.

Piştî desteserkirina gund ji aliyê Milîseyên "El'cebhe El'şamiyê, û Ceyş El'îslam" ve û destdanîna li ser piraniya malan û niştecîkirina anîndeyan tê de, tiştmiştên tevahiya malan hatin talankirin û dizîn, mîna: Xwarinvexwarin, firaxên baqirî, cerên gazê, alav û amûrên elektirîkê, raxistok û mobîliya, alav û pêdiviyên çandiniyê, giropên hilkişandina ava avdanê û yên bilî wan, û pez û dewar û mirîşkan.

Û weha jî wan (teksiya Mistefa Reşo, /3/ tirektorên çandiniyê yên "Ehmed Samî, Nûrî Ebdalo, Kenco Sîdo") û giropa hilkişandina ava vexwarinê ya giştî û dûmahîkên wê.

Herweha jî wan dest danîn ser malmewdanên hin kesên ne li gund û yên zoranê koçberbûyî, ji wan "Fewzî Elî, Malbata Reşo Emo, Mistefa Ebdalo"; Û li ser werzên/mûsimên malmewdanên din ên çandiniyê û piroseyên avdanê ji Çemê Efrînê vêrgiyan ferz dikin; Ji bilî wê jî çêrandina bêwijdan û bi zorê ji keriyên pêz û dewêr re di nav zevî û erdên çandiniyê de.

Û wan dar û daristanên îhracê yên li dor gund û bi sedan darên zeytûnê û meywan bêwijdan qut kirin, jê: yên "Beşîr Eswed, Nûrî Ebdalo, Hec Mistefa Kamêl, Kenco Sîdo, Ebid El'rehman Ebdalo, Cemîl Emo"ne, û rêjeya qutkirinê li çiyayê bi ser gund ve gihîşte 50% ji daristanê.

Û wan **Girê "Turindê"** (bi rûbera /2.72/ Hiktarî) û Cîgeha "**Zaretokê**" li Rojhilatê gund û hin din di navêna herdu Gundên "Turindê û Qîbarê" de li Çiyayê Lêlûn rêşkirin û kolandin, ji bo lêgerîna li kevneşopan û kinzên

binerd û dizîna wan, û bi sedema nelihevkirinê li ser parvekirina wan dizînan, li destpêka Cotmehê 2022an. Z pevçûnin di navbera çekdaran de derketin.

Weha jî xelkê gund ên ku li wir mane jî -di nav de jî jin û temenmezin- tûşî cûrbecûr binpêkirinan hatin, mîna: Revandin û girtinên bêsûcane û îşkencekirin û perestandin û kêmrûmetkirin û yên bilî wan; Û xort "**Şervan Hesen Qido** /27/sal" bêtirî çar salan di hepsa Bajaroka "Çobanbegê/El'ra'î"de zorane veşartî ma, ta ku li Tîrmeha 2022an. Z hate berdan.

Û ji sivîlên gund ev pakrewan bûn:

- Hersê zarokên xwîşk û birayên hev "**Hele/14/sal, Hisên/13/sal, Ferhad/10/sal**" - zaroyên **Rif'et Ibrahîm**, li 8.3.2018an. Z, di encama bombebarankirina Turkiyê ji gund re, bi ser de jî diya wan û zarokê birayê wan ê /3/salî birîndar bûn; Û li şeva 14.3.2018an. Z jî, di encama topebarandineke din de pênc zarok ji yekmalbatê bi kûranî brîndar bûn.

- "**Mihemed Cimo kurê Îsam** /20/sal" (ê zorane koçberbûyî), li 9.7.2018an. Z, di encama teqîna bombeyekê de li herêma penaberiyê - Bakurê Heleb.

Û li gund di navbera Giropên "El'şamiyê" û "Artêşa/ceyş El'îslam" de pevçûnin çêbûn, û niha jî Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah - El'emşat" gund desteser dikin, piştî qewtandina "El'şamiyê" jê li Cotmeha 2022an. Z ji aliyê "Desteya Tehrîr El'şam" ve, li dû pevçûnine xwînî yen ku sivîl bi tirsandin dane û di encamê de zarokek ji anîndeyan hatiye kuştin; Û li ser riya gund a giştî rêbendeke leşkerî heye (ye ku bi ferzkirina vêrgiyan û pêkanîna binpêkirinan navdayî ye).

**= Girtinine bêsûcane:**

**Destlatên dagîrkeriyê ev girtin:**

- Di navboriya du heftan de ji heyva borî /45/ hemwelatî -di nav de jî jin û temenmezin- ji xelkê Gundê "Dumiliya" - Navça Reco bi tuhmetên têkildariyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re -piraniya wan jî bi "pişikdariyê di payandina şevayî de", piştî bendkirina heryekî rojekê û ferzkirina sezayeke diravî/150/Dolarî li ser, û ji wan girtiyan "**Zimurid Şêxo/40/sal, Rodîn Şêxo/30/sal, Roşîn Hisên Gulîn /35/sal**" hatin naskirin, piştî ku ew vexwendin navenda Navça Reco, û hin din ên daxwazkirî jî hene; Lê "**Şukrî Sebrî Şindî /43/sal**" (ê ku li 22.5.2023an. Z hatiye girtin) bo Hepsa "Maratê" ya navendî li Efrînê hate guhestin, û ta niha bêsûcane bendkirî ye.

- Li 25.5.2023an. Z, Hemwelatî "**Mihemed Celal Qido** /29/sal" ji xelkê G. "Turindê" - Efrîn, bi tuhmeta têkildariyê bi R.X a berê re, û li 8.6.2023an. Z hate berdan, û were zanîn jî ku ew berê jî carekê hatiye girtin.

- Li 31.5 2023an. Z, Xort "**Amêr Silêman Mislim** /35/sal" ji xelkê Gundê "Aşkê Xerbî" û li Bajarê Cindirêsê rûniştî, û ta niha bêsûcane bendkirî ye.

- Li 1.6.2023an. Z, Hemwelatî "**Nûrî Ezet Erebo** /30/sal" ji xelkê Bajaroka Cindirêsê, bi tuhmeta têkildariyê bi R.X a berê re, û ta niha bêsûcane bendkirî ye.

- Li 6.6.2023an. Z, Hemwelatî "**Ehmed Ziyad Kirîşo** /25/sal" û diya wî "**Zekiye Arêf Elo** /50/sal" ji xelkê Bajaroka Cindirêsê, piştî ku mala malbatê hate basmîşkirin û hemî amûrên telîfûnê yên xilyewî hatin zeftkirin, û piştî rojekê herdu berdan.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

- Li şeva 28.5.2023an. Z, piştî ragîhandina vexwarina "Erdoxan" di hilbijartinên Turkiyê de, Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" qurşînên jîndar ji çekên sivik û orte bi jor ve û bi rengekî pir û tewşankî avêtin, û di encamê de hin sivîl brîndar ketin.

- Li şeva 29.5.2023an. Z, şer û dogişek û avêtina qurşînan di navbera anîndeyina de (en ku li Taxa Mehmûdiyê - Bajarê Efrînê hatine niştecîkirin) çêbûn, bi sedema avêtina zarokekî ji kevirekî re li ser dîkanekê, û di encamê de zarokek mir û çar kes -di nav de jî du zarok- rengereng birîndar bûn.

- Li siba 31.5.2023an. Z, çekdarin ji Milîseyên "Artêşa/Ceyş El'şerqiyê" û anîndeyin pê ve girêdayî ji Hemwelatî "**Şêro Hemûd kurê Mihemed**" re ( yê ji xelkê Gundê "Dêwa" û li Kolana/16/ li Rojavayê Kolana Yalanqozê - B. Cindirêsê rûniştî) sixêf û gef kirin, û qurşîn bi jor ve avêtin û herweha avêtin makîna Şêro li

pêş malê, û di heman demê de gef berve malên pakrewanên Newroza Cindirêsê 2023an. Z ên hemcîwar avêtin û li deriyên wan jî xistin, bê ku tu hesabî ji yekî re bikin, weke hewildan ji bo tirsandina Kurdan û têvedana wan bi aliyê koçberiyê ve.

- Li derdora kat heft ji şeva 3.6.2023an. Z, li kolana Başûrê Gergeha "Maratê" - B. Efrînê, Temenmezin "**Qedriye Cemîl Îbiş** /70/sal" - Jinebiya Dilovanber "Mihemed Ebid El'rehman Îbiş" ji xelkê Gundê "Ke'inîgewrikê/Kanîgewrikê" - Navça Cindirêsê bi qurşîneke tewşankî ye reşareke orte birîndar ket, û di cî de jiyana xwe ji dest da, lê jêdera wê qurşînê nehate naskirin.

- Li 4.6.2023an. Z, çekdarekî ji endamên Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" qurşîn avêtin du ciwanan ji anîndeyên ku li Gundê "Qeretepe" - Navça Şera hatine niştecîkirin, piştî ku wan destêwerdan kir ku wî ji lêdana zarokekî bi dûr bixin, û ji ber wê ew ji bo dermankirinê hatin şandin, û tewankar jî revî.

- Li berbanga 9.6.2023an. Z, li ser riya di navbera Bajaroka "Reco" û Gundê "Memala" yê hevcîwar de, du çekdarên serçavgirtî û li ser matoreke dutekerî qurşîn avêtin "**Ehmed Hesen El'nimir El'dixêm, Ebid El'kerîm Mihemed El'dixêm**" ji anîndeyên Bajaroka "Cercenazê" - Me'erit El'u'iman/Parêzgeha Idlibê, û di encamê de yê yekê hate kuştin û yê dudiyê jî birîndar bû, û herdu çekdar reviyan.

- Li 9.6.2023an. Z, xortekî çekdar ji nişteciyên Bajarê Cindirêsê - Pêkhateya Erebî du qurşîn yekser avêtin Xort "**Mihemed Umer** /18/sal û diya wî Fatme" ji xelkê B. Cindirêsê, li dema ku ew tevî dostekî xwe li nêzîk Pira "Tilsilorê" Başûrê bajêr bûn, û ji ber wê ew bo Nexweşxana Leşkerî hate rêkirin û piroseyên neştegêriyê jê re hatin kirin, û ta niha ew di rewşeke bîrveçûnê û lêsekirina mekin de ye, lê bê ku em kanibin sedeman nas bikin.

**= Qutkirina daran:**

Ji bo êzingkirin û çêkirina komirê û bazirganiyê, piroseyên qutkirina daristanên xwezayî û çandeyî û darên îhracê û zeytûna ji aliyê Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" ve berdewam dikin, di pêvajoya siyaseta **qirkirina jîngeha herêmê** û nixuma wê ya geyayî bi awakî rêkûpêkirî, jê:

- Li 28.5.2023an. Z, dareke sindiyanê ye temenmezin li nav zeviyeke zeytûna ye Malbata "Silêman Hec Nebo" li G. "Metîna" - Navça Şera, ji aliyê Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" ve.

- Wêneya makînak bara tijî êzingên ji daristanên Navça Reco qutkirî (yên ku Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" bazirganiyê pê dikin) giha me, û ew li 1.6.2023an. Z di rêbendeke Milîseyên "Lîwa'i El'muntesêr Bîlah" - çateriya Gundê "Hemşelekê" re derbas dibe, piştî derbasbûnê di rêbendeke "Asayêşa Leşkerî" re (ye di Derbasgeha Reco de) û rêbendeke "Firqit El'hemzat" li çateriya Gundê "Berbenê" (yên ku para xwe ji talanan werdigirin).

**= Binpêkirinine din:**

Li 24.5.2023an. Z, Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah" destdirêjî li Temenmezin "**Mihemed Arêf Birîm** /65/sal" ji xelkê Bajaroka "Kaxrê" - Navça Mabeta kirin û mekin lêxistin, li dema hebûna wî di nav rezeke tirî de bi mebesta payandina wê, û matora wî ya dutekerî û tibabeke diravî jê dizîn, û temenmezin ji aliyê derbasbûyekî ve bo dermankirinê hate şandin.

Ew girtinên bêsûcane û yên ku li gor şîretên devkî û giştînameyên bi dizî ji aliyê Istîxbarat û Destlatên Turkiyê ve têne kirin, ji Yasaya Navdewletî ya Mirovahî re berevajîkirinine bi robet in, çimkî Turkiyê dewleteke dagîrker e, û herweha çend pêngavên dadwerî yên dadmend jê kêm in, û tersî destûr û yasaya Sûrî ne jî.

11.06.2023 an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Mala"Hemîd Ebdalo" ya hatiye roxandin li G. "Turindê", di encama bombebarana Turkiyê de, 2018an. Z.
- Bombebarankirina mizgefta G. "Turindê" - Efrîn ji aliyê Artêşa Turkiyê ve, li dema dijberîkirina li ser herêmê, li 2018an. Z.
- Hersê zarokên hembira û pakrewan "Hele, Hisên, Ferhad" zaroyê Rif'et Ibrahîm.

- Pakrewanê ciwan "Mihemed Cimo kurê Îsam".
- Qutkirina darên zeytûnê li G. "Turindê".
- Rêşkirin û kolanidina Girê "Turindê" yê kevneşopî (29.1.2018an. Z berî dagîrkirinê, 20.3.2022an. Z piştî dagîrkirin û kolandinê), Gogêl Êrs.
- Pakrewan "Qedriye Cemîl Îbiş".
- Qutkirina dareke sindiyanê ye temenmezin e Malbata Silêmên, G. "Metîna" - N.Şera.
- Makînak êzingan radike, rêbendeke çekdar e "Lîwa'i El'muntesê Bîlah", Çateriya G.Hemşelekê, 1.6.2023an. Z.